Se'îd Yûsif

# Govenda dilan

Helbest (1)

Se'îd Yûsif

# Govenda dilan

Helbest (1)

**Çapa Yekê... 1000**
**Qamişlî- 11- 1995**
**Mafê çapê parastiye**

# Pêşgotin

Li destpêka pêşgotina pirtûka minî
Helbestan a yêkem de, min divê gelek
Tiştên giring bi kurtî bêjim.

Ne gereke ku ez ji hevalekî xweyî şa'ir an rewşenbîr re bêjim ta ku vê pêşgotinê dê min re binvîsê Çimkî di vê pêşgotinê de min divê xwe. b'Xwendewarên

Hêja bidim naskirin.

Û li ba hine din jî xwe bidim Xwyakirin.

Navê minî rastî û binemalî eve ez Se,îd kurê ûsiv ê Se,îdê osmên im ji devera Bişêrîyê me bi binemalî û Malbata me malbateke Remî ye ango ji Eşîra Rema ye.

Bî nîşana ku berî 65-70 Salî li wê herêmê bapîrê min se,îdê osmên di nav henk û tinazan de bi destên mala «Perîxanê» hate kuştin.

yên ku axayên «Eşîra Rema bûn»

Dêpîra min jî ango diya bavê min jî, ji binemaleke xwya yî bû navê wê

Gulê bu keça miradê kurtî yê zaxwranî û ji eşîra «Hevêrkan» bû

Piştî kuştina bapîrê min, bavê min

Bi xortanî dakete binya xetê «Sûryê» û li Qamişlo diya min bi jinbîtî naskir û herdu şo kirin «zwicîn»

Û ez hatime dinya yê di Sala 1948

di miha gulanê de li kolana qudûrbeg

Li bajarê Qamişlo-sûryê

Karê bavê min avakirina xaniyan bû (hoste) bû, lê di wê demê de kar kêm bû, bavê min

Jî gelek nexweşî, xîzanî û hejarî dît êdî ji behabûna tiştan û bê çarîyê me mala xwe bire «Gundê enterîyê» di Sala 1965 an de û piştî çend salekî dibistan çûme Dibistanê an xwendegihê heya bi sinfê: (serlifîka hunerî) fenî lê mixabin dibistanên hunerî wê çaxê li Qamislo nebûn.

Û divibû ez herim bajarê (dêrazorê) bixwînim lê feqîrîyê destûr neda ango Rê neda min de ez xwendina xwe ber-

- dewam bikim, û di wê demê de li dêma-
- hîya 1965 an de min dest bi fêrbûna

Tembûrê kir û ez zû pêşde çûm û berê jî min li hemberî mamostayên xwe hellbest û sirûd distirandin ji ber ku dengê min bersiv dida û wan dida razîkirin û hin bi hin ez fêrî temborê bûm û min ji xwe re hel-

bestên nû çêkirin an jî- nivîsandin û li gor zanîna xwyî wê çaxê jî min awaz ji wan helbestan re çêkirin û min ew stran di şevbiwêrkên dost û hevalan de di gotin. û ji ber ku şevên kurdî

di wê çaxê de ne serbest bûn û qedexe bûn ji bo wilo ez çûme beyrûdê- libnan - di Sala 1967 an de û min karê hunerî kir

Li wê jî min di radyo yê de kar kir û min çend sêlik û kasêt tomar kirin û di televizyona libnanê de çend caran hatime der û li çend ciyan û şanoyan min kar kir bi deng û Tembûra xwe, nêzîkî salekî li wê mam, dîsan vegerîyam bajarê Qamişlo di sala 1968 an de Min ew sêlikên kurdî ku min li libnanê çêkiribûn min kirin diyarî ji radyo wa kurdî re li Bexdayê û ew sêlik qebûlbûn û dengê min di radyowê de hate der her roj û piştî çend heyvekî ez çûme bexdayê-Radiyo wa kurdî û li wê jî bi serketim, bi deng, awaz şi,ir û tembûra xwe û min çend helbestên nû tomar kirin li gel çend parçe mûsîqe bi Tembûrê. û hin bi hin nav û dengê min belav bû. û di sala 1969 an de min jin anî

Û di sala 1971 ê de min mala xwe bi yekcarî bire Beyrûdê, û min li wê girûpekî folkiloî hunerîyî Mezin ji keç û kurên kurda damezirand (çêkir) bi navê «civata newroz».

Û me dest bi vejandina şev û ahingên kurdî kir û kunsêrta «şeva» kurdîya yekem, me di roja yekşemê rêkewtî 25 /4 an sala 1971 ê de û li ser sehna sinema =Rîvolî = çêkir û dibin sêber û çavdêrîya serok wezîrê libnanê de,

bê guman wê şevê, kurdên libnanê bi dehê gavan bi pêşde da û gelek kovar û rojnameyan.

Li ser min û indamên girûpê Newrozê û berhemên me nivîsîn û navtêdan ji mere çêkirin û gelek Radyo û televizyonê jî Pesnê min û Girupê min dan. çimkî ew şeveke dîrokî bû, û pir bi serket û navekî mezin da

Û navê min baş belav bû bi taybetî bi lêdane Tembûrê û navê girûpê mi,jî pir bilind bû dîsanê mi çend sêlikên mezin û piçûk çêkirin bi kurdî, erebî û turkî,

Û min ji gelek hunermendan re awaz çêkirin ji kurd û ereb û ferencîyan re

Û di sala 1973 an de ez hatim daxwazkirin bi navê rêxistina «Al yûnisko» da ku li Elmanyayê ez çend şevan-kunsêrtan- vejinim û beşdar bibim û ez çûme. Elmanyayê. û çend Şevên baş min li. Bonê û Berlînê: çekirin û di şevekê de gelek huner-hez û roj-

namevanên elmanî hebûn û piştî min strand û çend hawayên kurdî bi Tembûrê lêdan, roja dî rojnama pir pesnên min dabûn. û hina jî navê behlewanê tembûrê li min kirin û berpirsiyarê rêxistina = Alyunisko = li Elmanyayê Şêlikek.Z.D. ji min re çêkir tev serhawayên kurdî bûn.

Û di sala 1974 an de ez û girûpekî mûsiqî libnanî hatine da xwaz kirin û li gelek bajarên Efrîqî me şevên mûsîqa-Rojhilat- şerqî pêşkêş kirin û li gelek dewletan weke neycîrya- sîralyon û sahililac û.h.d. şevên me pir serketî bûn û em mane li beyrûdê heta şerê gelî an bira kujîyê dest pê kir êdî di sala 1976 an de em hatin şamê û mala- me ma li wê û demeke baş min li Radyowa şamê kar kir û ez bûm indamê yekîtya hunermendan li şamê ji wê jî me mala xwe bire bajarê Helebê di sala 1977 an de û mi firoşgiheke kasêtan vekir.

Û ji Helebê jî em hatin Qamişloka rêngî ew jî di dêmahîya sala 1979 an debû. û weke ku herkes dizanê di warê mûsîqê de xebitî me û ez di xebitim û baş min xwe daye pêş. bi hemî hawa. bi deng, awaz şi'ir û tembûra xwe û ji sala 1987 an ve ez di çim Ewrupa yê û têm û li wê jî min baş xwe da nas-kirin,

û li piranîya bajarên Ewrupa min şev çêkirin û di wan de beşdar bûm. û her bi ser diketim. îsal ez baş fikirîm mi dî dengbêjên kurd bi dehan Helbestên min birin û bê rez û destûra min gotine an jî strandine û ji ber ku şi'irê min gelekin û pir jî winda bûne. ji bervê yekê û b,navtêdana Hevalên minî nêzîk mi xwest ez van helbestên mayî yên ku min nivîsîne kom bikim û ji winda-bûnê bi parêzim, û ramana çapkirinê di serê mi de bû û min xwest ez bi serbilindî pirtûka xweyî helbestan çap bikim.

bi rastî ev diwana minî yekem rengekî wê taybetî heye û tameke Serbixwe didê.

Ji ber ku jimara mezin ji van helbesta yên ku min çê kirin û bi stran gotine û li hemû cî û deveran belav bûne û bi nav û deng bûne û hin helbest ji wan bi dengê wan hunermendên ku min şi'ir û awaz li gor dengên wan çêkirirbûn bela bûne û çi kesên ku ew helbest bihîstibin û guhdar kiribin wê b'hesanî karibê nas bikê û veqetînê.

Û ez hêvîdarim çi mirovê vê dîwanê bixwînê pê kêfxweş bibê û mebesta min ewe ku ez şahî û şadîyê bixim dilê xwend-ewar û hunerhezan de.

heger tu kêmanî jî hebin û ez bawerim wê hebin

ku li min bibûrin ji ber her merovek sînorek jêre heye yê min jî sînorê min eve û tu kes nîne bê kêmanî.

Û razîbûna we ji min re zor giringe û hin navtêdaṇeke pir bi hêze û ṣefirazîye jî ji min re.

**Se'îd Yûsif**
**Qamişlo 10-8-1995**

# Eman Cîhan

Eman Eman eman Cîhan
Sing û memik nûke gihan
Çav û birh û lêv û dinan
Ĵi mire bûne derdê giran

Xwezka ez bûba me bilbil
Mi j'tere xwendiba l'ser dil
Bê çi pêhat bo te Sorgul
Yeqîn l'mi xayîne zeman

Roja te l'mi kire nezer
îman ji serî hate der
Tu bidê xatirê Pêxember
Rehmê bikê gula baxan

Rehmê bike l'min ê sîrî
Gava d'hatim devê dêrî
Mi l' wan çavê reş dinêrî
Te berê xwe j'mi d'guheran'

Xwezka tu beşişya b'lêva'
Bi wan hinarkê sor wek sêva
Minê b'gota j'îro pêve
Dil ji tere rewşa dilan

# Eyhanê

Awirxerab lê EYhanê
Memik hingivê nîsanê
Tiwî heyva li çardiha'
Ti car nayê wesfdanê

Navê te û hisna te l'heve
Rih û canê m' mane b'teve
Lê xwezka salê du şeva
Mi t'bêhn kirba reşrîhanê

Dîtna te j' mir bûye meraq
Ez serxweş bûme bê eraq
B'xwedê goz'ne mrim bê lifaq
Tu ya vî rihîyî canê

Heval gelek mid'lomînin
Yeqîn hemû bê evînin
Heya wê roja te bînim
J'wan re derkevim meydanê

# Bê Sozê

çavê min te na bînê
Bê soz û bê qirarê
Dil xema di hilînê
Lê ji kerbê te yarê
Birîn ji rengê xwînê
wek sorgulê buharê
ku ne ti bikewînê
Bê sozê kes nikarê

B'şev û rojê d'nalînim
Û tu nel'ber çava yî
J' xelkê were ez dîn im
Çimkî tu ne xwîya yî
Herdem ku te ne bînim
Derd l'mi d'bine peydayî
Hew pêşya xwe dibînim
Ti l,min nakê ronayî

Dil dibê kul û keder
Çimkî tu l'min na pirsî
Ji botewafa dîlber
Ya ku j'xwendê na tirsî
Yar nexweşe nayê ser
Bixwînê ayetkursî
Rih û dil, can fer bi fer
Bi gorî te bin her sî

# Rewşenê

Rewşê Rewşê Rewşenê
Pepûkê l'te rebenê
Qîz û xurt tev zewicîn
Ez û te mane b'tenê

B' hisna xwe b' nav û dengî
Tu sosina heft rengî
Mame l,benda te û kengî
Ev gul bighê sosinê

roĵkî kara min bike
B'lêvan yan bi memike
D' Zû miradê min bike
Lê hatime ber mirinê

Hij te dikim bê qedar
Bi vî dilê birîndar
T'hinav l'min anîne xwar
Û berdam' ser rûkê dinê

L'benda te mam çendî sal
Bav te nadê ji ber mal
Xwe j'bo te bikim evdal
Go ev dunya b'mi b'kenê

# Çavreş

Çavreş û bejinzirav
B'serê xwe l'min kir silav
M'nizanî işqa wê behre
Mi b' herdu linga' da bû nav

Rûniştî bû l,devê derî
işaret kir j'mire b'serî
Lê wextê gava m'lê nerî
wê şewitand dil û hinav

Digote min Xorto were
J'tere bêjim du xebere
pir mid'vîbû herim bire
Lê m'nedî wekxwe bê zirav

Ziravê min diqetîye
Gava awir l'min danîye
Laşêm' sist dibû dijdîye
Wek ti l'mikê sê zerik av

# Gulperî

Were were wer Gulperî
Tu Canikî xweş esmerî
Wê kêlîka te l,mi nerî
Te dilê m'kir parçe û kerî
Mejî û sewdan tevde firî
Were were wer Gulperî

Mi l'te meyzand te dey nekir
M'işaret da te fêm nekir
Gotina l'te eser nekir
Ti d'bê qey tu ne beşerî
were were were were
were were wer Gulperî

Pora tarî û çavên belek
Xalê l'riwan m'nedî l'esek
Mi'b' tere biwart nîv şevek
Bûme senem li ber derî
were were were were
were were wer Gulperî

D.M

# Gulperî

Ez zanim tu nefsmezinî
Xweşikî tu şenge jinî
Xwe l'mi mezin nek ezbenî
Tu ne keça pêxemberî
were were were were
were were wer Gulperî

Xwezka te ew dil daba min
Singa sipî sipartba min
Û rojê heft cara' t'raba min
Te çi b' gote l,ser vî serî
were were were were
were were wer Gulperî

# Meşî û meşî

Meşî û meşî û fistan li ber bê ket
Û aqlê m'firî, firî û pêre bi rê ket
Wextê wê b' çava' li min meyze kir
Dilêm şewitî nû agir pê ket

Geva ew meşî dil meşî pêre
Hebkî m' xwe ragirt j'arê xelkêre
Şewqa wê dida ser şewq zêre
Lê mi d'go' belkî agir b'dinê ket

Mi'd'gov' horîye ew qet ne jine
Qurbano xuda t'wê bik rizqê mine
Tîra evînê wê avêt bû mine
Tîra wê hat û l'nîvê hezebê ket

De bi meş bi meş nazikê bi meş
Ez bi xulama wan herdû çavê reş
Wan herdû dêmên sorî nazikî geş
Ew bejna nilind ya pişka min lêket

# Hemberî min

Hemberî min nesekine
Tîra navê dilê mine
B' xwedê te b'xwe ez helandim
Çavê te l'kuştina mine

Mirin xweşe b'rehetî bê
Û işqa dila tebayî bê
Ne kuştin şîn û girî bê
T'agir berda nava min e

Pir ji mi're dibê derman
Tu bikenî ji dil û can
ew singa te bibê xuyan
Û na kim ji te ti gazine

Ez dilbirînim hîn ji mêj
Sewdan firî mam ker û gêj
Du galegale j'mi're bêj
Ew tenê dermanê min e

# Narincîyê

Nerê Narê Narincîyê
L'te dikim yek qawîtîyê
Gava bêm û te bixwazim
Bêj' bavê xwe min bidîyê

Çavên te j'ezmanê sayî
Kirasdirêj daw berdayî
Canê ti j'mi're birayî
Ka maçekî ji wê anîyê

Gelî bira loma nekin
Hûn bi serê bavê xwe kin
Li min guhdar bin deynekin
Ev heft sal min dil ketî yê

Aqil û sewdan firîye
Nizanim b'kûde çûîye
Dil û kezeb tev helîye
Ji bo xatrê te zerîyê

## Ne Xwyane

Ne xwyane xifşa xezala ne xwyan e
Carek ez dîtim li dilê min kire ferman e
Xwe l'mi dînkir wê dil birîn kir nekir derman e

Bê pirsîyar wê ez hingavtim bê piriyar
kenî çavê xwe l'mi şkandin bûme bendewar
Wê ez kuştim tev biriştim li min bû neyar

Naçê j'bîra min sed salî naçê j'bêra min
Ew zalim bû lê xweşik bû kete dilê min
B' kû ve herim çend bi gerim ew ma l'bîra min

Ez mam bê mejî b'yek awirê mam bê mejî
Min hew wê dî j'bo bê rehmê dil jê bu tijî
Ez çi bikim jê hez dikim ew mi' d'kujî

# Gulê du gul

Gulê di gul d'ber serî re rakirin e
Ev sê se'et l'pişta xanî l'benda min e
Gelî kala' hûn ti loma ji min nekin
Ji van tişta' pir bi serê we hatine

Nekin loma gelî bira
çimkî ev dem wilo d'xwaze
Zemanê me pêş ve çû ye
Ew bê hed gelek tewlaz e
Dido aşiq bin yek bê
Hişe û ê dî jî qet ranaze
Ev dilê min li cem wê ye
Rengê wê l'ber çavê min e

Gul di bakê ax û eman
Qîr û gazî bê feyde ye
Rihê wê çûye j'kerbê min
Dilê mi' jî li ser heye
Bavê wê jî pir zalim e
kula wî zêr û per ye
Tirsim gulê j'qehra bimrê
Gunih b'kevê stwê min e



D.M

# Gulê

Ez di razim ez di rabim
Gul ber çave winda nabê
Gul d'vê hero bê cemin
Lê dora wê xalî nabê
Dilê mi' jî pir henûn e
Qet çara j'dilê min nabê
Min û gulê soz da ye hev
Hêvî xweda yê mezin e

## Zînê

Wa kevoka li ser hêlînê
Silavê min bighêne zînê
Tu vê gulê bibe diyarî
D'pencerê de bere bicînê

Go dur bim hedana min nayê
Ku nebînim dikevim tayê
Min dil û sewdanê xwe dayê
Ez dîn bûme j'derdê evînê

Kaxezkê dişyênim yek vedgerê
Sozê me b'cîne wek mêrê berê
Ne ew deme bînim bi xencerê
Xweda miradê me bi cî bîne

Em ji hev dûrin lê em heval in
Bo dîna hev m' nexweş û bê hal in
Me j'hev hizkir ji dil em dinalin
Kesek nîne bihna me derînê

# Lê Narînê

Lê Narînê û nazelînê
Û xemrevînê û pir şêrînê
Law nexweşe ne dilgeş e
Bo keleşa ew dimrînê

Dil ketîye nav devîye
Nav heftciya û dinalînê
Here pêve b'iwan lêva
Bi êşê ve j'ser hilînê

Dil birîne û kezeb xwîne
Lawik dîne Bo te zînê
Ez ne Mem im b' kul û xem im
her dem bidem T'mi'd' helînê

Mi' tobe ye piştî te ye
Ta dil heye na hebînê
Maçek bide bona xweda
Mi' dil dida te şêrînê

# AX ji kerbê

Ax ji kerbê bav û bira
wan ez xistim nav agira
Ê mi d'xwazê min nadinê
Wan çavê xwe berdan pera

Yekî gelkî perelî be
Bera dîn û serserî be
Bav û bira wê 'm bidinê
Go bedlek li bejna wî be

Kanî ew bavê şîrhelal
Bê' rab ser xwe keça delal
Min te da yê te hebndî
Fedî çavê' te next û mal

## bêje eman

keç:
û
kur:

Bêje eman
j'kul û xeman
Xelk zewicîn
û ez û te man

kur:

Lê zerîyê
xweş gundîyê
E' l' hêvî yê
V' sal û Zeman

keç:

L' ber miradê
Yabo û yadê
Bo t' mi nadê
Xortek j'kurdan

hur:

Tu min nadê
B' şewq şemalî
Dil di nalî
Min bi qurban

keç û kur :

werin keç û kur
Dîlan e li vir
Me zora wan bir
Bûn bûk û zavan

# Keça kurd

Keça kurdê serbilind
Bejin zirava nûhat
Ma hê baz û kew û gund
Bi hevdû re d'kin xebat
Tu bêje min baş û rind
çawa ne çiya û lat
Ewqas rê û mêrg û gund
Ew xeml û xêl a welat
Civatên xortên lewend
Qîzê bê mehr û xelat
Bêje mizgînê bi min d'
Dil wê vidê tirh û kat
Welat nadim b'sîn û hind
Dayka kurdê dil şewat

**d.m.**

## keça kurd

Em bi xwe li vêde man
Çawa d'bînê şenge jin
Man bê xwedî û xwedan
Xelk li me zorê dikin
Kes nema j'me bê lêdan
Bê xeber û bê gotin
Serîk ji me bê hildan
B'hezara' j, me tên girtin
Bi xwe goştê hev naxun
Li ji kurda re xurt in
Me navê qesr û dikan
Hemû xuh û kur û jin
Tev jî bibê bi qurban
Roja ceşna mey mez in

# Canê

Wa canê te nexapînin
Xweyê te tev pîs û dînin
Ew divin te ji min dûrkin
Çimkî ew Min na hebînin

Wa hey ji dilê te tunne
Go agir li ser û bin e
Ew divin te bidin hine
Bo hezarê xwe bistînin

Ew bavê te xweş zilame
Dêka te jî pir temame
Bê ez miryê xurtê ha me
B' çavê rehmê l,mi' meyzînin

Ap û xalê te tunne ye
Metê û xaltîkê çi j' te ye
Ew tev kula wan pere ye
Ne ciyê te xwes bibînin

Ew get bi camêrî nakin
Çimkî divin min windakin
Wê pîja d'çavê xwe rakin
Qey divin xwe bi hetkînin

Heger ew te nedin min e
Rab destê xwe bide min e
Sed mêr heye l'pişta min e
Bere heyfa xwe hilînin

# Nazike

nazik e û pir şêrîn e
delal e Allah yi'îne
Wellah b'hibe min qelbî
Bera kes mi'ne lomîn e

Kiras l'bejnê di nale
iyûna sûd qettale
wê ez kuştime bê derb
Dexlek tustirnî ya reb
Dil tev kirya kul û kerb
Sayre lil qelbî Zîne

Wellah rah t'ceninî
Gava b' mi're dikenî
B' hibe kitîr ya selam
Go di bakê wa pismam
T'hakînî b' ecmel kelam
E' d' bê ji wê pêve nîne

Ew bûye rewşa qîza
Ele qelbî ktîr ezîze
b' gorî xwedê li banî
Ma ad tiqder tinsanî
Ez malxwê ew kebanî
xelî hed la yhakîne

# Gundîno hawar

Ez gêj kirim b'van gazin e gundîno hawar
Ew sorgula l' nav sosin e gundîno hawar
Dibêjê ti j' min heznakê gundîno hawar
Ew ezîza dilê min e gundîno hawar

Dil didimê gelek cara, gundîno hawar
Çavê min bo wê şiyare gundîno hawar
Ew j' dilê min re bihare gundîno hawar
Dilê min pê diskine gundîno hawar

Dibînîm madê wê kirî gundîno hawar
Yan xeyidî yan digirî gundîno hawar
Min şîretkin aqlê m'firî gundîno hawar
Wê çawa bê halê min e gundîno hawar

Bêyî wê b'tenê na mînim gundîno hawar
Çê na bê hero nebînim gundîno hawar
Ji bo wê ez har û dînim gundîno hawar
Hêjî bawer nakê j' min e gundîno hawar

# Serî deyne

Serî deyne li ser singê
Singa min balgîyê teye
Bihn xweş tire j'gul û pûngê
B'di hinara ve j'tereye

Raze tu neke mitala
Guh nede van pîr û kala
Guh ned hevalê' zimanxweş
Mi j'xwere bike hevale

Raze xema ne xwe tu car
Bo te ez mame birîndar
Tu delalê dilê min î
Ez bi gorî te hezar car

Mijul ne be b'zêr û pera
Ne çêtire j'sing û bera
Sing û berê min buhuşt e
Tu di karî bibê j'xwe re

# Pir Şêrîne

Kurdistan pir şêrîn e
Hemû mêrg û kanîn e
Ew buhişt a cîhane
Buhişt jê pêve nîne

J'pênc hezar sal em hebûn
J' wê demê m' azade bûn
Milet bendestî me bûn
dijmin zanê em kîne

Kesra ew tac û eywan
Yek ji me bû ew sultan
Ew bû sultanê cîhan
De tarîxê bixwîne

J'berê de em xwyan e
Welat her kurdistan e
Miletê merd û zan e
xweyê aqlê zûrîn e

# EZ Kurd im

EZ Kurd im serbilind im
Kurd im ji min xwyane
Rast im û rastîya min
Bewerî bi yezdan e
Cenga min xebata min
Rabûna mi b'îman e
EZ merd im mêvanê min
J' wan re dibim mêvan e
Camêrim û derdê min
Xweşîya van cîran e
Bo camir û hevalan
Li dev şêrîn ziman e
Ez mêrim û pirs bikin
J'dost û neyaran e
Tu kurdî ew jî kurde
Ne baş l'nav me neman e
EZ Şiyar im li dijmin
Divê bikim Ferman e
l'gewr û reşan dinêrim
Di bêm'insan insan e
Naskirî me û xwya me
welatê m' kurdistan e
Canfida me bo welat
Welatê qehreman e

D.M

# EZ Kurd im

Oldar im rastîya min
Dîn û şûr û qur'an e
Canfidane bo welat
Herdem em canfidan e
Em kurd in em cîhan in
Kurdistan ew cîhane

# Hîyamê

Te j'min dil bir wer Hiyamê
Ez dilketim bejnê û qamê
Şewq û Şemal daye dinê
Zerîyê û memik şimamê

Nazikî û rindî ciwanî
Natirsî j'xweda yê banî
Dil birîn e û tu dermanî
Te Soz da soza te kanî

Awirên te j' topê' terxan
Te j'xwe berda bû dil û can
Lê tu na tirsî ji xwedan
Tu nadê min yek ramûsan

Ew paye b'kêrî te nayê
Û Şewqa te bavê Daunyayê
Gelî bira' min dil dayê
Şerê vê rindê j' min nayê

# Ji Serê Xanî

Ji Serê xanî were xwar
Dakev nav van xortên Şiyar
Gul sor dikin d'riwê tede
Were were l'me b'ke bihar

Ez yek ji van Xortê yeman
J' Serê m' firand dîn û îman
Derdê min j' derdê bê derman
j' kerba te dikim hewar

Buhişt ji singê xuya ye
Wek şewqa find û çira ye
Memka' sers singê palda ye
Awir ji tîrê bê jimar

Serî deyne ber min carek
Tu ji xwe re neke arek
Kulê dilê m' bûne barek
Bi kêmanî bûne hezar

# EZ nikar im

Ez nikarim rabim ji va derda
Piştî min te ji van desta berda
Berê çavê te di çavê m' debû
Tu di rabê xwe dikê pişta perda

Berê tu hero li cem min bûyî
Min dev didanî li ser wî riwî
Mi d' go behara dilkê min tûyî
Û serê xwe didanî l'ser wa zenda

Piştî te pir lê dînê d'nalînim
Û ro' bi ro b' xwedê l' xwe dişkînim
Lê wextê te bi çava dibînim
T' komek agir bi destan dikê dil de

Tu bê hed gelek dînê t' mekarî
B' wan xeberê xweş j' devête d'barî
Ez helandim kirim tirba tarî
Nema îna nasdikim j' van lehda

# EV dilê min

Ev dilê min tev birîn bû
Bakin gewrê j,bo derman kê
Kezeba min tev bi xwîn bû
Vê işqê Z' birim helakê

Çawa te bînim bi xweşî
Çendî ziravî û nav xweşî
Mi d' kujî gava ti d' meşî
Ti diçê û titê l'i vê sikakê

Guh ned' van hevalê' dijmin
Tev de di be,ecin ji min
carek tenê soz bide min
Derba bibîn meşordekê

EZ xortekî pir hêja me
Di cengê de b' deh mêra me
Ez weke te nû giha me
Meyz ti b' serê bavê xwekê

# Li nav bexçe

Nav bexçe l,bin darê liwa'
Sê keç li wê ketin xwa
Mi' yek kir himbêza xwe de
Û guhê xwe neda didiwa

Yek esmer bû pir delal bû
Yek boz bû b' şewq û şemal bû
Ya min gewr û çavxezal bû
xweşiktir bû bihtir ji wa

Ez û esmera l'hev nakin
Ez û boza ne yek tak in
Lê gewrê çavreş pir pakin
Henûnin mîna mêkewa

Gewrê çavreş xwînşêrîn in
Li ser Soza xwe dimînin
Weke rîhanê tim şîn in
Kêm hene l'dinê weke wa

# Kî Karê

Kî karê li vir alî min bikê
Min derînê j'evîna keçikê
Wê xêrek mezin bibînê
Ji vî agirî min derînê
Agir avête dil û gurçikê

Ev ne evîne bavo agir e
Dilê vê rindê tev ji kevir e
Ez kirim êsîr û belengaz
Xelkê gund tev zanin hûr û gir e
TU kesî alî min nekir
Dîlber dilê xwe venekir
Çawa bê halê min û xweşikê

Ji ber wê her dem bi êş û jan im
Li ber wê ez bê dev û ziman im
Dinalim halê min nîn e
Derman pêre ye dizanim
Ji bo wê ez har û dîn im
Sebrê bi gulyê wê bînim
Heye bê rehmê ew xwe baş bikê

## Ka destê xwe

Sebar li ber vî dilî
Ka destê xwe vir de were
Ez dîn bûme li ser te
Û aqlê min maye bi tere
Sê çar gotin b' mir hene
newêrim bêjim ji tere
Ramûsanek bide min
E' b' xula me sing û bere

Sebra li ber vî dilî
Ka destê xwe j' tere bêjim
Ez dîn bûme li ser te
Û bo te hêstira' dirêjim
Ez ne dîn im ne lal im
Û ez ne har im ne gêj im
Ramûsanek bibe min
bes gunhê min bibe j'xwe re

Çiqa gava te di bînim
Aqil û sewdan di firê
Rehim li cem te tinne
Bê îmanê dilkafirê
Carek li min na pirsî
Hey beraz bavê te mirê
Dilê m'li ser agir bê
Lê yê te jî l'ser agir e

# Xwe ne veşêr

Xwe ne veşêre kubar
Serûkê hilîne
Tu pir delalî canê
Riwê te zêrîn e
Tu rûqurmizî
Wek sêvê xelatê
Tu xeber şekirî
Lêvê' te hingivîn e

Ro' li min bûne sal
Bo te şêrînyarê
pir dikim nale nal
Derman bik kubarê
Zerya m' çavxezal
Tiwî bûka tarê
Çavê min bûne newal
Tu bes min bigrîne

Ez ne xerîbim kubar
Xortekî gundî me
Ez evîndar im bawer ke
Lê ez ne xwînî me
Çavê min qurimîn
Ji te bi hêvî me
Birînê m' gelek kur in
Tu wer bikewîne

# Xemê

Lê xemê xemhilgirê
Çime gelek tu d' fikirê
Salek may ye ez te bînim
Çime ti l'mi' na sebirê

Tu ne bêje ez xemgîn im
Ez te bi çava dibînim
Ji bo te ez har û dîn im
Lê çawa ti jî na mirê

Ew roja te xem hilanî
Lê wê êşê b'xwe l'mi' danî
Memkê xwe b' desta, hilanî
Ji xeynî min kes na kirê

Ezê te bînim lê xemê
Wa kulîlka devê çemê
Sewdanê min tim li cemê
Te d'bînim aqil difirê

# Mal di gund de

Zerîya mal di gund de
Derb nîvê dilê min de
kirim weke pepû kê
Di xwînim mîn a kund e

Xerîb im ne ji vir im
Kes nîne pê b'şêwirim
Kuştim e şixwe na mirim
Dîne l'xerabê gunde

Talya emra mirin e
Çi bêjim bide min e
Ku hina behsa te kir
Ez ê bê qîzek rind e

# Şukra yê

Ax û yeman şukrayê
Rêdûrê Xeber nayê
Çavê mi b' rêde mayê
Dil xwest û min jî dayê

Sebra min bête nayê
Şêrînê nû gihayê
Te z' kuştim te z'helandim
Te z' berda me dunyayê
Ax û yeman şukrayê

Nazikî û navgiran î
Ti b' derdê dila zanî
T'agir berda vî canî
Hêjî tu nayê rayê
Ax û yeman şukrayê

Were ba min şêrînê
Derman bik' vê birînê
Kes vî derdî nebînê
Dimrim tu b mi've nayê
Ax û yeman şukrayê

Bûm nexweşkî bê derman
J' kerbê kitek ramûsan
M' nedî wek te bê îman
B' tere ketim balayê
Ax û yeman şukrayê

# Kezî dirêj

Kezîdirêj tê bîra te
Ew roja me gul diçinîn
Destê li ser sing û bera'
Herdu lêv bi mi're d'kenîn

Ma tê bîra te xweşkokê
Man e li çolê şev û rokê
Em ketin behsa evînê
Li nav gula li ber cokê

Em çûn e nav baxê gula
Di hat dengê van bilbila
Kaba min li ser kabê bû
stiryê gula ketin dila

Tê bîra te ew evînî
Ka ew maçê hingivînî
Te d' go kuro t'çend delalî
Mi d' go tu zêde şêrînî

# Dil birişt

Dil di navê de birişt
Wê keçê ew xort di kuşt
Bi paye û qure û giran
Wê dî go lawik nezan
Ji lawik re d'vê nivişt

Lawik nedîtîye evîn
Ji bo wilo ew bûye dîn
Mejî û sewdanê wî firîn
Dilê wî ji derda bû mişt

Çi bêjim wê keçikê
Ya van tişta pê dikê
Êşê tavê te gurçikê
Gawir e ew ne ber û pişt

Lawik pir bi aqil bû
Evîndar û bi dil bu
Keçik pir bi ser hil bû
tiştek bi lawik ve nehişt

Dibînim wilo d'helim
Bo wilo dil bi kulim
Di navê de di kelim
Kafirê dilê wî di hişt

# Îro dîlan e

Îro dîlan e li gund
Sê zerî hatnê bi lez
Mi l' yekê baş nerî rind
Çûme tilya xwe bi gez

Ez çûme nav dîlanê
Min didî keçên lewend
Li vir û l' dera hanê
Mi b' wan re kire govend

Min di ber wxe re di got
Wê keça rindî ciwan
Rindê te dilê min sot
Tev de em bidin civan

Go min civan e b' tere
Kenî destê min guvaşt
Siba l'binya bêndera
Te jî dilkê min biraşt

Roja dî min wê didî
Me da hev soz û peyman
Wê ji min kire fedî
Min stand çend ramûsan

Ez û wê bûn dost û yar
Bi dîtin û evînî
Li dilê me bû buhar
xweş buhara evînî

# Çav kevan

Ew çav kevan
Memik fincan
Ziman şêrîn
Lêv weke xwîn

Awir di jwar
Birya hev xwar
keçek keleş
kenekî xweş

Keçek zan e
Zor ciwan e
Jina mala
Bê heval e

Mam e l' bendê
ji bo rindê
Ne lebitî
Nav peritî

Hûn dilbirîn
L' çava nerîn
Ev bê qisûr
Nêzîk ne dûr

birî qeytan
ew sing dikan
xweşnazelîn
ya reb subhan

bê kar û bar
meşek siwar
dêmekî geş
bê car û war

pir giran e
jê xwîyan e
pir delal e
bê civan e

l'cem govendê
maçek mindê
dil şewitî
bo lewendê

bêjin amîn
l' esmanê şîn
ev gulîhûr
bo yek cengîn

# Kinê

Lê b'lê kinê kinê kinê
Ev sê sal tu l'bendî min ê
Bavê te qet razî na bê
Ez çi b' kim heyata min ê

Derba mezin bav li te de
Xwe d'kê devê riya tede
Ji bîr nakim ez wê rojê
Min tu xwest û wî te nede

Çavê' wî her li hezara'
De t' bi mînê l'ber dîwara
Tu birçî bê ma ne şerm e
Xelk na bêjin çi sersar e

Beraz e çare jê na bê
Bere mi j'tere qirar bê
B' zor û xweşî tu ya minî
Go dunya l'serê min rabê

# EV heft sal

Ev heft sal çûn bi hejmar
E'l' hêvya teme kubar
Dîtna te dermanê dil e
J' serî difrînê aqile
Bihar l'ber te çiye bihar

Lêvên te j' pele gulan e
Dêm wek sêvan nû gihan e
Bejin wek şitlek rîhan e
B' singê ve hene du hinar

Dêmên te j'gulê berbero
Ez hero' wa' d' bînim hero
Ku berê xwe didin mero
Merov pê dibê birîndar
Noqteng ti d' bê nîne heme
Telî weĸe mûm û şime
Birhên te j' xetê qelema
Por bi ser de hatîye xwar

# Qudret û qublet

Qudert û qubleta van xwortên ciwan
Nêrgiz û sosin û gul bejin rîhan
Bere t' xezal bane li mêrga mez in
Ez û tembûrê bo te bûba şivan

Ne bêje ez ciwan im pir giran im
Heger tu baş bê rindê bi te zan im
Evîndar im ne file û misilman im
Tembûr nexta te her ew e ber çavan

Bi şev û roj ez dibakim tu nayê
Te ez kuştim kafirê were rayê
Tu weke min na bînê li dunya yê
Xelk zewicîn her ez û te wilo man

Dîlbera min wer carek min bibîne
Ez nexwexş im dilê min bi birîn e
Bav te nade çimkî bextê wî nîne
Ax û Ax ji ber bavê bê îman

## Leylan

# Ew jî jine

Ew jî jin e agir kete mala min e
Go ştexilî ticar dorê nadê min e
Por bi rişke weke keja van bizin e
Bê xîrêt e kesî jê re bişo tine

Dinanê wê weke ferşikê epraxa
Zikmezin e xwar in xwe re hemû çaxa
Go di razê weke yek merşekê raxe
Dibê can im ma we ê wek min dîtin e

Rû b' qirêje weke eyarê gemarê
Firnikê wê eyn weke qulê kewarê
Girêza wê weke şirikê buharê
Notsalîye û hê hermetê ne mezine

Go di rûnê bi mêkuta na lebitê
Ew ti cara j' xwe têr nebê ji pitpitê
Go dipişkê wek ti j'xwe re dan bi kutê
Fişfişa wê wek gayê bixwê kizine

# Navê tey şêrîn

Navê tey şêrîn
Her du çavên şîn
wa' ez helandim
Û kezeb kirne xwîn

Wextê dirazim
Ti tê ber çava
Wextê dirabim
Ar digrê nava

Wextê di meşim
Ez ne dilgeş im
Ez pir bê hiş im
Dil dibê birîn

Tu bi xwe kuřbar
Te hey j'mi tinn e
Sewdan l'cem teye
Ê te nel' cemin e

Gundî hewar e
Dilêm' birîndar e
Çimkî bi yar e
Yarek e xweşik
Bê soz derewîn

# Welatê Comerdan

Min çavê' xwe dan ber kil e
kezyê' xwe berdan ser mil e
Gula' teva' pel weşandin
Gava çûm nav bexçê gula

Kî li pêşya mi b' sekinê
Meyzekê l'min şenge jinê
Çavê min awra bidin ê
Ez ê agir berdim dil e

L' serê mine taca zêrîn
Ez tu carî nayêm kirîn
Gelek bo min rijîye xwîn
Min dilê dijmin kir kul e

Ez' im kurdistana kurda
Ez' im welatê comerda
kurdo destê min ne berda
Ezê te têxim paxila

# EZ Xort im

Ez xortim dilêm' xityar e
Çima gelî aqildara
Nizam' j' derdê malê dinê
Yan ji derdê dost û yara

Maldar çilo mal d'civînin
Çilo van keça' d'neqînin
di meşin xwe na leqînin
Ti d' bê qey lingê' wa j' dar e

Zêr û pera dikin tur de
Jin xweşike d' hindirû de
Feqîr kevir d'kê bin ûr'de
Jin j' birçîna d' kê heware

Soza xwedê b' wan re heye
D' bê malê min tev j' were ye
Wa b' xwe jî îman tinne ye
Başên wan wek koremar e

# Ez te nadim

Kur:

Ez te nadim b' malê dinê
Esmer rindê emrê minê
Bi şev û roj te j'bîr nakim
Her se'et tu l' bîra minê

Keç:

Reste kuro j' te bawer im
Ew agir ez jî li ser im
Mi d' vê herdem li cem tebim
L'ber çavê te herim werim

Kur:

Ji te pêve mi kes nîne
Ji işqa ketim livîn e
Dilê min tim li cem teye
kes nîne dilê min bîne

keç:

Dilê me her weke hev in
Em çi bêjin em ê hev in
Ê' divê xwedê bidê wan
Ê' nevê ber ticar nevin

D.M

# EZ te nad im

Kur:

Keçê dilê min helîye
Weke berfa l'serê çîye
De em bikin kêyf û seyran
Îşê xelkê bi me çiye

Keç:

Bes van derda' bike peyda
Ez çı bêjim tu ne xeyda
Rabe de em herin welat
Hev bikin em li cem seyda

Keç û kur:

Em tifiqîn ser vê yekê
Rab tu b' serê bavê xwekê
Emê herin kurdistanê
Kurd li dîlanê meyzekê

# EZ ne har im

Ez ne har im Ez ne dîn im
Ez evîndar û xemgîn im
Dîlber dilê m' kir kul û derd
Hêja ezê dilbirîn im

dîtina te dermanê dil
Jê difrînê sed xem û kul
Bike carek rehmê li min
Tu dibînê ez dimrînim

Bo te dîlber ez nexweş im
Ez aşiq im ne serxwes im
Ez bi te gelek dilgeş im
wê gava te têde d'bînim

Heval gelek mi d'lomînin
Yeqîn hemû bê evîn in
Heya wê roja te bînim
Wê bi zan in ez ne dîn im

# Dîlber hat

Dîlbera m' hat
Hat wê û seyran tev bi xwere anî
Ro' l'mi hilat.
Hilat û şewq û şemalê dabû beyanî
Awir şewat.
Awir şewat weke tîrê şêxê gêlanî
Her ew heyat
Çimkî m'heyat û mal û mewdan ser didanî

Nazik kubar
Kubar û meşordek diçê viyalî wîyalî
Dîtin hezar
Gelek xeberxweş û şêrîn û lê tê delalî
Dikim hewar
Hewar ji derdê çavê reş ev dil dinalî
L' dil bê buhar
Buhar ku te j, xwe re bînim zeryê b'helalî

Heram li min
Heram zewac ji xeynî te li min heram bê
Kî bidne min
Tu car ev dil bi kesî dî qet razî nabê
Çi b' kin ji min
Çi b' kin ji min go ev dunya tevde l' mirabê
Soz bê li min
Ez te bînim yan ciyê min hebs û zin dan bê

# rexne

## Ne mîne raketî

Yabo ne mîne raketî
Topa xwedê li rih ketî
Te b' xwe nextê xwe vebirî
Û dame kalê dinan ketî

Ez weke xifşêk  xezala
Çima tu min didî kala
Nextê nexwe ne helate
Hey kêm aqilê paşketî

Min bide xortekî ciwan
Min nede kalê bê dinan
Min nefroşe malik wêran
Xelk ji te mane behetî

Wê darê xwe bi hejînê
Wê mejyê min bil qînê
Ez ê bikim girî û şînê
Ji xwe ti l'malê rehetî

# Heyatê

Heya ta min heyatê
Çîçeke nav civatê
Keçê çiqa t'zalimî
Kuştim awir şewatê

Heyo deme tu hatî
Wa rewşa vî welatî
Şewqa te dabû vade
Memik sêvê xelatî

Çavê te j'çava kufş in
Mijgûldirêj û reş in
Bejin wek şitlek rîhan
Dêmê' te sorî geş in

Her tiwî bûka salê
Çavreşê çav xezalê
Tu ji bîra min naçê
Dil ji bo te dinalê

Hew pirbike van kula
Birîna neke dila
Destan di destê mike
Evîn nav baxê gula

# Derkeve der

derkeve der
Kêlîkî were vêderê
Dil bo du ker
Bo xatirê te esmerê

Te Z'helandim bi carekê
Ji bo yek ramûsanekê
Te dil bir ti winda nekê
E'b' xulam dilê min werê

Tu hêjayî û dil kevirî
Ji bo te aqlê m' di firî
Tê rojkî m' bibînê mirî
De ka heya ew ro werê

Kanî sozê te b' mire dan
Sozek ji wan ne bû xwyan
Te soz de bide j' dil û can
Weke sozê mêrê berê

Evîndar bi min nizan in
Go derdê min pir giran in
Awrê te tev êş û jan in
Te dil da bû ber xencerê

# Dîna welat

Va ez herim kurdistanê
Gewrê çi ji tere bînim
Min tiştek navê emrê min
Min divê werim bibînim

Rindê gelekî na mînim
Bes deh roja bi hijmar
De li mi dê bayê hînek
Li ser bêxal û serçinar
Bo ez vexwum avê jînê
Ji wan çemê yên xwar û mar...
Va derdê min bûne hezar
Ezê bihna xwe derînim

Sûndê dixum ez bi yezdan
Wê li min bibê êş û jan
Hew bi min dikevê hedan
Te hew dî çavê min razan
Ji xeynî dîna kurdistan
Ji boyî min nabê derman
Min divê ez vegerim can
Van birîn a bikewînim

.D. M

# Dîna welat

Ji wan çiyayê tev bi dar
Ezê bînim sêv û hinar
Çend baqên gulên sorî zer
Ji sosin û nêrgiz hezar
Mistekê ji axa welat
Vexum ava kanîyên sar
Dilê min ma ye birîndar
Diçim gelekî na mîn im

De here ezbenî here
Here û hew li min vegere
Yan ezê bême bi tere
Rabe min bibe bi xwe re
Welat dibêjê min were
Dilê min pir bi kesere
Ez jî gelek kezeb xwîn im

De rabe de em tev herin
Li welat em baş bigerin
Bibînin wan xuşk û bira
Ji pêşmergan û leşkere
Tev dibêjin şam şekire
Misir hê jî jê xweştire
Sîn û hind jî j'wan bihtire
Lê kurdistan şêrîntire

# Hey wax

Hey wax hey wax
Piştî te jinê ezê nû çibkim li dinê
Hey wax hey wax
Ezê çi b'kim çimkî îro ti ne ya minê

Gelî bira m'nedî wek wê
Awir dijwar
Go çava digrê li Xewê
Ti wê d'bînê şiyar
Meşa wê meşa mêkewê
sing di heb hinar
Bi silavê re di tewê
Dîn kirim yek car

Dîlber go ti ne ya mi bê
Çib'kim ji zêra
Deşt ne li ber pala mi bê
Û singa te pêre
Şiyar bi mînim ta sibê
Rindê bi kêre
Go ti ne xew xweşa mi bê
Naçim nav mêra

# EZ bilbil im

Ez bilbil im dil jikestî
Bê ra û tedbîr
Wê ez kirim çerm û hestî
Ez mame êsîr

Xwende van bûm şehreza bûm
Ez birim ji rê
Ez Zane bûm têre xwe bûm
Çi go m' go' erê
Ax j' derdê gewrê
Ya l'mi xist ew tîr

Çavxezal bû pir delal bû
Sewdanê m' firî
B'wî kenê xweş b,wan dêmin geş
Min xwedî mirî
Çavê min digrî
Min xwe kıre j'bîr

Bê heval im pir dinalim
Tîr avête dil
Ne aqildar ne evîndar
Dernexist ev kul
Her ez im bilbil
Bê ra û tedbîr

# EZ Pir delal im

Ez pir delal im
Ez kar xezal im
J'tere ne xeme
Bo te di nalim

Ez xwîn şêrîn im
Lê dilbirîn im
Te dilê min bir
B'işq û evîn im

Min date nîşan
Dil û rih û can
Carek bê were
Îşev tu mêvan

Derdê min bar in
Hêstir dibarin
Tu dûrî ji min
Ma em neyar in

Ez ê her bakim
Ta ez dil şa kim
Bi te hewceme
Keskî dî na kim

Ne dil şikestî
Raje vî destî
Wer min bi xwaze
Û bibin dergistî

# işq û evîn

Min navê işq û evîn
Gelî hemî hevala
Ax j'derdê zerîya
Va rinda û çav xezala
Carkê yekê êz dîtim
Hêja dilê m' dinala
Çend sala ez şiwitîm
Nizanim çendî sala
Cark rindê ez dîtim
Gote min çi hewala
Erê dilê te kanî
Xortê hê ja û delale
Min go li min bibûre
Dilê min her li male
Min ji we carek nedî
Ji xeynî gale gale
Kesê di işqa we de
Birîndare bê hale
Nama divim wê isqî
Bi derd bi mitala
Min bîya bavê nekir
Ne biya ap û xala
Hûn rojekî dikenin
Roja dî jiyan tale
Xortekî nû hatî bûm
Ez bûm kalek ji kala
Ev dil navê evînê
Bo nebim dîn û lale

# Dil Kanî ye

Dil kanî ya kul û dera
Xanim tu jêre dermanî
Te dil heland kezen b'serde
Roja awir te l'mi danî
Were xanim were were
Were kurbar were were
Awrê te tîrê dijwar in
Te dilê min dabû bere

Carek ti wer cem min carek
Kulê dilê m' bûne barek

Ez gerîyam m' nehişt warek
M' nedî wek te b' dila zanî
Were xanim.................

Mij' dil û can tu hebandî
Piştî m' çav gelek girandî
Te ya go dilê m' revandî
B' desta agir pêve danî
Were xanim................

# Wa mencê

Wa Mencê wa Rîhanê wa Sosinê
Tim Şiyar bin birhê bidin xweninê
Jin çênebû ye ji bo karê malê
Vê demê dewrek mezin daye jinê

B' lîlandinkê jin mêr dikê wek şêre
Jin seyran û tizbî û xencera mêre
Çi Xweşe mêr bi xebetê û jin pêre
Dîtnek wilo hejaye malê dinê

Jina kurd pir zane ye b' gorî wê me
Lê çibikim hin xwendin ji wê kême
Welat got keça kurd el hêvya wê me
Hewar keçno bixwînin xwişkê minê

Pêşketin a jinê j'mere xebat e
Em tenê man bê xwendin l'van welata
Keçek kurd serbest nîne l'van civata
Ê şa wê kêm xwendine guh bidinê

Gelka j'me jin j' xwe re kirya bindar
Bê te çi kir û te çi çêkir û te çi xwar
Û çend gotinê pir nexweçî sipî sar
Ti car berê wê nadin pêşketinê

# Xortê Serbaz

Wa xortê serbaz
Kalê ser firaz
Keçên gerdengaz
Newroza me hat
Tev bikin dîlan

Bankin b' lî landin
Sirûda b' xwendin
Dengê xwe hildin
Bê bijî welat
Wa bû ka cîhan

Bikin terp û toz
Bo ceşna newroz
L' hev bikin pîroz
Li kurda xebat
L, dijmin her neman

De m' çêkin agir
Hersal li vir û wir
Ceşna kurd ne mir
Li hev bikin xelat
Piroz li kurdistan

## Ne mîne razayî

Kurdo ne mîn e razayî
Serî rake serî rake
Destan bide min û rabe
Kesî dî arî me nake
Werin tev em bibin yek
Bixebetin gelek çake
Pir bi xebatê bûn milet
Kurd bela xwe j'hev venake
Ev çi veqetandine ku
Ew tiştekî ji mere nake
Xwe ne mrîne dema teye
Bes lihêfê b'serî dake
Welat ji me bi hêvîye
Divê xebat her xwyake
Çavvekirî be lo bira
Dijmin divê me winda ke
Gava em yek û siwar bin
kes nikarê me peyake
Kurdistan li hêvya meye
Divê herkes j'me ava ke
Lê ku ji dijmin jî werê
Wê kanîyên me ziwake
Kurdê xebatker xwyane
Xwîna wan dirjê sikake
Welat dibê ew ne kurde
Yê bo min xwe fida nake

D.M

# Ne mîne razayî

Bi hezara' sal bwirtin
Kerd li paş ma wek rî kake
J'rihê şêrîn dest bidin hev
Kî karê xwe d'nav me rake
Bêşa welat ku bê ser te
mal û can tev bi qurban ke
Ew kurd nû bi rastî kurde
Kes nikarê wî biha ke

# Gerdengaz

Gerdengaz tu gerdengazî
Guh bide min belengazî
Te z' kuştim bê sûc sebeb
Bê je min ti çi j' mid xwazî

Bi qapan gelek nefs mezin
Gelek car mi j' tekir gazin
Silav bide b' wî destê bazin
Bo Dilê min j' te bibe razî

Bê mal im j'mire nexeme
Bê hal im aşiqê te me
Dinalim ti nabê çime
Ma te d' vê bibim rût û tazî

Divim tu bi mi re bi kenê
Û dest bavêjim wê gerdenê
Bê m' te divê carek bi tenê
Wê j' mire bibe serfirazî

# Ez Sûnd dixum

Ez Sûnd dixum b' serê te
Tu b' tenê l' bîra minî
Ev xortê gundê me tev
B' wa dikenim ezbenî

Ez im xwesika tarê
Desmala ser destê te
Soz didim te vê carê
Keskî nakim xeynî te

Ti raze bê kul û derd
Û bes bi mîne şiyar
Bes dil bigre û yekî berd
Mi j' xwer bike dost û yar

# Bi di qulî    Çava Kilke

Kur :

Çava kilke xeml û xêla
Xwe girêde keça delal
Were dilê min der man ke
Te derb lêde û bêje menal
Were were were were
Were were z' xwa nakim
Ji kul û ji van kedere

Keç :

Nayêm nayêm nayêm nayêm
Nayêm dil derman nakim
Nayêm ez ne dektor im
De z' birîna re ra kim

Kur :

Keçê z' mirim te b' xwe l'min
Rakir fermane û dil şewitî
Were b' mi ve dîtna te
J' mi re dermane û ti na labetî
Keçê te baskê m' jêkirin
Mam bê mefer
Kor bûm mi da ser şopa te
Û nîne veger

D.M

# Çava Kilke

**Keç :**

Lawo xwya ye derdê te
Pir gira in
Ez jî b' xwe zanim awrê min
Êş û janin

**Kur :**

Dem û dewranê Z' xapandim
Dilêm carek l' dêv te meşî
Te z' kirim wek ker û gêja
kul bûn barek m' nedî xweşî
Te ez xistim agir de
Nikarim xwe derînim
Di bakim û ti nayê
Ez nikarim te bînim

**Keç :**

Xortê hêja menale
Rih l' te nema
Te çi j' min divê ser sera
Va l' ber te me

# TU Sebebî

Ez ê bimrim tu sebebê
Te agir berda kezebê
Mirim li ser bextê tebê
Ma kî ez kirim vî halî

Çi b' kim gelî aqildara
Dilê m' b'i gazî û hewara
Ma ez tenê bûm bi yar e
Dil ji kerba wê dinalî

Carek wê soz b' mire dabû
Hingî Dilêm daxwe û rabû
Dihat xanî nû av bû
Di çû xanî dima xalî

Mirim çima ti deynakî
Dila bi hev tu şanekî
Dilê m' maye li ser takî
Qet naxêvî ma tu lalî

# Xewna min

Şevek ji van şevê han
Min didî xewnek ciwan

çûm ser çiyakî bilind
Min nerî l' dor xwe rind

Erdek bi bax û bistan
Hemû nêrgiz û rîhan

Kanîyên ava zelal
Û mêrgên şîn û delal

Hemî gulên zer û sor
Pal dane hev hawîrdor

Dengê şalûl û bilbil
Pir ji dil firandin kul

Min di kir dengê çûka
Û xemla çiya wek bûka

L' birê miyan û berxan
L' dengê bilûra şivan

Hat bîra min xortanî
Ew roj mi l' bîrê tanî

# Xewna min

Min qelûna xwe vêxist
Mi çend hilmê baş lê xist

Çavê min jê di bû mişt
Gava min dî ew buhuşt

Tev de çiya û ne wal
M' keç dîn b' şewq û şemal

Şêrîn û bejinzirav
Min li wan kire silav

Gotin ser çava pismam
Li wê dê hene zilam

Hatin pêşya min du mêr
pir bi hêrz û mîna şêr

Min ji dil silav da wan
Di gotin fermo heyran

Te çi d' vê kekê hêja
Min go çîrok dirê je

Hatim vir min rê şaş kir
Mi b' hatina xwe baş kir

D.M

# Xewna min

Min dî ev buhişta han
J' serê min firî sewdan

Go ev diya kurda ye
Û ciyê bav û kala ye

Başe tu hatî çiya
V' kurdistana rêngî ye

M' kurd in ev kurdistan e
Ti jî xwe b'de xwya ne

Gava wilo wan di got
Hêstir dihatin bi cot

Ji işqa min da girî
M' welat dî ez ne mirî

Zanîn ez ji kurda me
Ez ketim nav pismame

Şabûn bi wê xeberê
Bi dîna min l, wê derê

Ez birim cîkî mezin
Bi kurda dam naskirin

D.M.

D.M

# Xewna min

Destek çekê leşkera
Gotin li xwe ke bira

Tu jî lawê welatî
Li ser çava tu hatî

Mi dî hilçenîm ji xew
Dikim qebqeb mîna kew

Min di girt xwêdanek hûr
Wek ez bême j'rêke dûr

Ev bû xewn a go min dît
Bi xewnê ez bû me egît

Ez xewn a xwe bînim cî
Çêtire bibim hecî

## Porsor

Porsor û porsor ciwan
Te b' mire da bû civan
Soz da min ez xapandim
Ma l'dinyayê soz neman

Riwê te j'van sorgula
Li ser lêvê bismila
Tiwî merhema dila
T'ya mi ba ez bûm siltan

Ka desta vir de were
Emrê min b'emrê tere
Sing dikan a bê pere
Kê dî go sing bû dikan

B' xwedê ti b'xwe b'mi zanê
Ez miryê teme canê
Ji kerbê ramûsanê
Bûm nexweşkî bê derman

# Sirûd

# Ey newroz

Ey newroz Ey newroz
Ceşna kurdê qehreman
Her pîroz her pîroz
Tim li kurd û kurdistan
Hildin jor û jor û jor
Ala rengî bê hildan
Na tewê na kevê
Na şikê na mirê
Miletê kurd na mirê

Te rêka xebata ewil
B' miletê kurd dabû nas
Zor birinê m'kiribûn
Kêmketî bê mefer xwas
Ew kawa yê dînemêr
Hat milet jê kir xelas
Na tewê na kevê
Na şikê na mirê
Miletê kurd na mirê

Îro ew bayê hînik
Çîçeka d'he jînê
Li her ciyî seyran e û
Teyr j'kêfa di xwînê
Newroz kurdo l'te pîroz
Çi xweştir j'vê mizgînê
Na tewê na kevê
Na şikê na mirê
Miletê kurd na mirê

D.M

## Sirûd

## Ey newroz

Bo milet tev zanibin
Kurd tu car nakê xewê
Her egîte û şiyar e
L' ber dijmin ew na tewê
Serfiraz e l' her ciyî
L' kurdistan û li vir û l'wê
Na tewê na kevê
Na şikê na mirê
Miletê kurd na mirê

# Sînem

Te ez kirim zîndanê
Na bînim vê cihanê
Ji mijê ji moranê
Sînem gula nîsanê
Awir ji derbê şur in
Birînê min pir kûr in
Ez û te ji hev dûr in
Na pirsê li min canê

Ez dixum kul û xem e
Rindê nel'bîra tem e
Mirim rih li mi nem e
Sînem bi te hewcem e
Mi navê jarî û mestî
Ez bûme çerm û hestî
Ji gava dil ti xwestî
kulilka devê çem e

Tu min bibîne yarê
Rehmê bike yek carê
Ji dil tu bike çarê
Sînem gula biharê
Ma ti b' derdê m' nizanê
Wey dilêm sînem xanê
Bide yek ramûsanê
Em hev bikin kubarê

# Ev sed car

Ev sed carî dibakim
Ez ê dila b' hev şa kim
Kurd im kurê kurda me
Sozê xwe winda na kim

Şêwirîm b' vî sewdanî
M' navê te l'ser dil danî
Ma kî heye j'te pêve
Ji mire bibê kebanî

Çawa te ji bîr bikim
Vî dilê can pîr bikim
Tiwî çira vî xanî
Çawa çirê kwîr bikim

Mi soz da mi l'ser sûnd xwar
Evîna te l'min bû bar
Evîndar tev di razin
Bo te di mînim şiyar

Çima ti dil bi kulî
Wa hevala ewilî
Çendî bê yar bi mînim
Ti wî berxa vî dilî

Mi soz daye j'dil û can
Li bate dibim mêvan
Bo te ez birîndar im
Bo birina m'tu derman

# Kurdistan yan neman

Kurdistan yan neman
Em kurd li ser ya xwe man
Bo kurdistana rengîn
Em tev jêre bi qurban

Na tirsin ji tob û ber
Em singa xwe didin ber
Roja ku em dikin şer
Weke em bikin dîlan

Lo lo kurdo bik xebat
Va îro roja me hat
Em bostek erda welat
Nadin bi malê cîhan

Em ev kurdê dîne mêr
d'meydanê de bûne şêr
Bo erda mey zîv û zêr
Em dikin şerê giran

Pêşde diçin na çin paş
Me dijmin tev kir kelaş
B'yekîtî ya kurdê baş
Bi şiwr û raye merdan

# Hêstirê min

Mi keç dîbû l' ser kanî yê
Ji binya mala me wêde
Li bin sîka darê bîyê
Mi dest kire paxla wê de
Wê zerîyê ez helandim
Ez pûç kirim j'kabê pêde
Ez bê hiş û sewdan kirim
Ez dîn bûme j'wê rojê de

Hêstirê min di barin
Kulê dilê m' hezar in
Her çavê min şiyar in
Xelk dikevin xwê de

Diçê avê esra teng
Di bînim di çê dereng
J' min derna yê his û deng
J' kerba d'kevim tayê de

Tirsim ji xwîn şêrînê
Mi l' bîra xwe neyînê
Derman nekê birînê
Taba m' herê b, avê de

Hewar ev çi 'agire
Carek li min na nere
Hindik maye ji mire
Dîn bim b'revim b'çolê de

# Kî heye

Ew pêşmergên qehreman
Rizgar dikin kurdistan
Li wan newal û çiyan
Li wan tê berf û baran
Kî heye mêrtir ji wan

Dirahêjin tifinga
Bi çiya dixin denga
Erd di hejê l'ber linga
Dikin fida rih û can
Kî heye merdtir ji wan

Şev û rojê dikin yek
Ji di jimin kuştin gelek
Ji bo wan bircên belek
Welatê bav û kalan
Kî heye şêrtir ji wan

Dikin himîn û gumîn
Weke şêrê dev bi xwîn
Dijmin bi qîr û nalîn
Tirbê xwe bi dest kolan
Kî heye zîrtir ji wan

D.M

# Kî heye

Bi şev bi ro rûnanî
Cengê didê xwyanî
Bo ala herê banî
Bûye çîroka cîhan
Kî heye zêrtir ji wan

Têne kuştin bi deha
Walat parêz in niha
Bi wê xwîna xwey buha
Rêka me didin xwyan
Kî heye çêtir ji wan

# Tu newe

Tu newe ber çavê min
Ne bere te bi bînim
Agir berda rihê min
Ez berê dilbirîn im

Sê çar soz b' mir dabûn
Yek jî ne b' serê xwe bû
Xwe d' çavê min de reş kir
Dilê mi j' te tije bû

M' ne dî wek te derewîn
T' keçê kurda d'xapînê
Yan bi rastî ne kurdî
Van îşa b' serê m' tînê

Xortê kurda pir baş in
Derewa l'keça na kin
Ser soza xwe di mînin
Û keçên kurda pir pak in

# Yar yar

Yar yar yar yar
Keçê ez bû me dîn û har
Yar yar yar yar
Bo xatirê te gulbehar

Bo tez' bûm dîn û ker û gêj
Ranazim van şevên dirêj
Ez miryê te me hê ji mêj
Bese j' sozê tey xwar û mar

Ji zûde te dilê m' revand
Bi êsîrî l'duv xwe gerand
Te birîndar kir û êşand
Êşandin a derba neyar

Raste dilê m' hewceyî teye
Çimkî aqil bi tere ye
Êw pepûkê bejna teye
Te jî ne soz û ne qirar

Hinkî ji payê kêm bike
Dilê b' evîn b' hev şa bike
Û hezkirin a min bê şike
Bê sûc mi ne êşî kubar

# Xatûn

EZ ne bûm xatûn a li ser texte
Bûm keça kurdê bi soz û bexte
Ne şermê xorto b' tere bi meşim
D' cengê de wek mêra bidim rexte

Bere xort bê b' leyzê b' van xencera
Bere keç bê l' ber wî here û were
Cejne îro hildin ala rengî
Û ala me kesk û sor û zere

Şahî û seyran wê bavêjê çokê
newroz bûke b'xemlînin xweşkoke
Tev werin kes li mala ne mînin
Çi kal û jin xort û zaroke

# Kubar can

Kubar can kubar can
Evîna te j' mir bû jan
Kubar can kubar can
Çavreşa memik fincan
Dunya tev j' te hezdikê
E' b' gelkî bêhtir ji wan

Bo te ranazim bi şev
Ez xilas na bim bi rev
Ew çavên te û lêv û dev
Ji serî firandin sewdan

Te dil birîndar kirî
J' qehra ez dikim girî
Ez têm heya cem derî
T' na bê kermke mêvan

Ev salek dido sisê
Ma ti j' xwe dê na tirsê
Heye ti l'min bipirsê
Tu li min bibê poşman

Tu pir ciwan û rindî
Tiwî rewşa vî gundî
ka roja ez vî zendî
Bikim balgî yê rîhan

# Mala We

Mala me l' cem mala weye
Ti b' tenê sebra mi b' tetê
Dilê m' gelek di te heye
Wa gezoka l' dara ketê
Dawet íro l'gundê meye
Rabe de m' herin dawetê

Bejna te j' dara xêzeran
Ti l' xweke wî xişrê giran
Destê min bigre û bike dîlan
Delalê şêrîn şerbetê

Go yekî weke mi b'tere bê
Ti xwe b' hejînê j' kezebê
Û xeftanê b' qeseb li te bê
T' nizanê çiqa li tetê

Tê qîz û xorta dîn bikê
Û dilê kala pir şa bikê
Tê dîlanê ruhnî bikê
Hey stêra j' ezmana daketê

# Biken gewrê

Biken gewrê l' min binêre
kezî dirêja b' erdê re
Gundî û cîran b' me hisîyan
M' hev bikin j' qehrêxelkê re

M' wek te nedî naz û ciwan
Dilbirîn im tiwî derman
Awrê te ji tîr û kevan
Te berda xortê bajê re

Dilê m' ti car na sekinê
Dinalînê û na hedinê
Bo xatrê te şenge jinê
Tiwî ya dil ma ye pêre

Wê delala dilêm' tibê
Xewxweşa êvar û sibê
Hindik ma ye tu dil bibê
Tiwî bidê ber va kêre

## Bi du qolî      Destê canê

Kur:

Kanî destê xwe canê
Zerya min reşrîhanê
Buhar hat û gul vebûn
Rab de m' herin seyranê

Keç:

Bi meş derdê xwe bêje
Wa xortê rindî hêja
Ez jî bûme wek gêja
De m' rûnin l' dera hanê

Keç:

M' te dî cara ewilî
Evîn kete vî dilî
Dil j' birîn a xemilî
Ti b' halê min nizanê

Te dî cara ewilî
Evîn kete vî dilî
Dil j' birîn a xemilî
Ti b' halê min nizanê

Keç û kur:

Bihara min û tey ye
Xêr ne xwaze çi j' me ye
Dilê me l' ser hev heye
meş de em herin dîlanê

# Nede Xapa

Mi j' te hezkir ne de xapa
Rabe raj destê mi rabe
Rabe de m' herin seyranê
Bo dilê me hebek şa be

Xorto gelek evîndar im
Mi d' vê bêjim û ez nikarim
Ji bo te ez birîndar im
Wexte aqlê min winda be

Rab' de m' herin nav nêrgiza
Ez biçinim tu bi dize
Pey tê kevim tu bibeze
Bi mëş giyê daye kaba

Dil evînê daye sere
Aqlê mi ma ye bi tere
Dilê m' bi kul û kesere
Ne b' tebê çara jê na be

# Ez poşman im

Ez poşman im
Were li min veke derî
Ez ne zan im
Dilê min bû ye du kerî
Ez mêhvan im
Bo te gelek dikim girî
Bi guman im
Go bi tere bibim serî

M' nizanî bû
Ti wilo j' mi re başî
M' jin anî bû
Dilê min pir kir bû şaşî
Kêmanî bû
M' gelekî xwe hişt li paşî
Poşmanî bû
Ez ne ma didim wî kaşî

Îdî rabe
Were derî li min veke
Wilo na be
De em ji nû bibin yeke
Na dim xa pa
Rabe de m' bikin heneke
Û mal ava be
Kes bê dilya ê dî neke

# Çavê Xezalê

Çavê te xweş çav in xezalê
Ne çavê xezala l' berîyê
Qirka te dirêj e delalê
Ne qirka qazê yan qumrîyê
Singa te sipîye hevalê
Ne ew berfa li serê çiyê
Lêvê te şerbet in kulmalê
Ne ava d'herikê j' kanîyê

Bê hiş û sewdan im ji bo te
Carek te b' mi re neda civan
Lê xwezka rojek te bigote
Îşev l' cem min tu bibe mêvan
Çend maç te daba cot bi cot e
Ew singa te hatiba tevdan
Ber m' cile rihê xwe bifrote
J' bo te z' gerya be ez bûba şivan

E' j' te bi hêvî û guman im
Bo te d' nalim dil bi evîn e
J' xelkê were z' dîn û nezan im
Ti d' bê teva evîn nedîne
Go te d' bînim weke beran im
Ji kerba te ketme livñ e
Serîkî wer nebê z' giran im
Ti wer mi j' halî derîne

## Dengek xweş tê

Dengek xweş tê min ji dûr
Çepk û stran û tembûr
dîlanek wê li dare
Kêfkêfa dost û yare
Civata kala d' gerî
Çend xort d'leyzin bi şûr

Keç û xort dikin govend
L' hev pêçane dest û zend
B' lî landinê keçê can
Xorta b' reqsê kir dû man
L' cîkî dahol û zirne
L' yekî kemaçe û bilûr

Dîlanek xweş di gerî
Qizek hine l' serserî
Ev cejna me kurda ye
Kêfa qîz û xorta ye
Zavakî rindî delal
Bûkek hêja bê qisûr

De lêxin lêxin ji dil
B' singê û hejandina mil
Gunhê xwe bi weşînin
Avê j'erdê derînin
Bere l' ber bayê b'kevê
Ew eprî û gulyê hûr

D.M

# Dengek xweş tê

De rabin xuşk û dayê
Xortanî hero' nayê
Bakin jin û mêra tev
Bo bikevin destê hev
Bi dîlanek wilo xweş
Derman dibê brînê kûr

B' hûrizê û eraqîyê
B'govedê û koçerîyê
Bi diyarbekrî û çaçanê
Kî van reqsa nizanê
Werin xuşk û birê min
Kes nebêjê l' min bi bûr

# Gelek Dêşim

Ez gelek dêşim
Tu b' ser min na kevî
Ti b' dil neyarî
Û dosta bi devî
Min dil û can tev
Sipartine te
Ji bo çi kubar
Tu ji min di revî

Ez pir j' te hezdikim
Ti b' qedrê min nizanî
Ev dilê min gelek
J' bo te xem hilanî
Carek were cem min
Bê je tu çawanî
Te z' pîr û kalkir im
Zeryê tu ciwanî
Ma ne te nadim
Bi vê dinyê tevî

# Gelek dêş im

Dîtinek ji te
Rih l' mi d'vegerînê
Ti xwe giran dikî
Bihtir mi dêşînê
Serîkî l' mi naxî
Carek mi na bînê
Ma ne dilê min
Bo te dinalînê
Ji bo te agir
Herdem pê dikevî

Heger tu ya mi bê
Çibkim j'zêr û zîv
Ştexalîya te hingiv
Ew ken gwîz û be'îv
Ew henek xweş xanî
dîtan te taştê û şîv
Go mi sar bê himbêz
Lihêf û hin balîf
Mi germ bê singa te
Wek berfa yek şevî

D.M

# Gelek dêş im

Ez bi xwe gulim
Û tu pel û şaxî
Ez miryê te me
Çavreş tu saxî
Ti l, mi nayê rehmê
Ti b' qapan û baxî
Kanî ew qas henek
Seyran û gezmaxî
Li ser wan kanîya
L' hawîr dar û devî

# Ew mi d'kujî

Ew mi d' kujî ew
Ew yara bedew
Soza didî min
L' min dikî derew

Ez dikim nalîn
Dil der man nabê
Histir dibarîn
Ew divê şabê
Ev xewa şêrîn
B' çavê mi nabê
Û jêre ne xeme
J' xwe ranabê j'xew

Wê qehwe da min
Û hinek ava zelal
Wê soz b' mire dan
Keça rindî delal
Aqlê min ma l' cem
Rojek l' mi bû sal
Mi dehvik vedan
M' negirt ew mêkew

D.M.

# Ew mi d' kujî

Her dibê dîlan
Di rûnê l, hember
E' b' şi'ir û stran
Her davêjim ser
Wilqa bi qapan
Pêre nakim der
Wilqa distirînim
Carek na bê tew

Li nava ba xan
Tîr avît vî dilî
Gul tev weşîyan
Gava diştexilî
Awirik da min
Go j' riya min hilî
Lê carek dî
Bi dûv mi de new

# ...Tu minetan

Tu mineta l'min dikî
J' bo t' xweşikî û dirêj î
Berê xwe j'mi d' guherî
Gelek dêşim bi wê jî

Derda l' mi d' kî peydayî
Xwe ya çavê kildayî
Dibakim û ti nayî
Ya dilê xwe nabêjî

Ez can û pir delal bûm
L' bendî te pîr û kal bûm
Bo te ez gêj û lal bûm
T' nabê bo çi tu gêj î

Go çavê min l'te d'kevê
Ez ranazim wê şevê
Çibkim dilê m' te divê
Bo te mame bê mêjî

Kengî di' a mi b' cî bê
Tê bê û hindur tijî bê
B' kêf bikenê û razî bê
Û şekir j' lêva birê jî

D.M.

## Tu minetan

Dîlber ez ne şaş bûm
Lê te z' kirim şaş
Ez herdem li pêş bûm
Te z' histim li paş
Riya rastî hebû
Te berê min dida kaş
Û başî gelek hebû
M' ne dî tiştê baş

# Li nav gula

Li nav gula li nav gula
Tîr avête dil
Çi d' go j' mire mi d' go bila
M' wê danî l' ser mil
Evîn ji nû kete dile
Gava m' dî sorgul
Ez dînkirim bê hişkirim
Firandî aqil

Li nav reza li nav reza
Wê da min desmal
Û baqek ji gul û nêrgiza
Go j' tere heval
Bistîne çend maç û geza
De ez herim mal
Ez j' tere me ne xwe xema
Wa xortê delal

L' ser kanîyê l, ser kanîyê
Carek çûme cem
Ya dilê xwe mi gotîyê
wê hilanî xem
Behre dilê min ketîyê
Ne tenik wek çem
Ax zerîyê j' feqîrîyê
M' dişkînê herdem

D · m ·

# Li nav gula

Werin keç û xortên çê
L' kevna bi civin
Ê' di xwê nextê keçê
J' nav me derkevin
Çima xelk pêşve di çê
Êw l' paş dikevin
keç xwe karkin xortwa mehrkin
Yê go hev divin

# Rexne Bi şûnika

Werin bi şûnika l' mi xên
Bi mêkuta min biku jin
B' jinkê re ketim belayê
Kê j' mi re go z' bikim di jin

Ez bi yekê re bikenim
Ya dî jê di barê xezeb
Û her dibê fişfişa wê
Ew digrî bê sûc û sebeb
Heta êdî wê haşt bikim
Wê b' êşînê dil û kezeb

Yek ji xwe re kiraskî bînê
Ya dî xwe nexweş dixînê
Ku yek jî serê xwe bişo
Ya dî b' car kî xwe dimrînê
Kalkê mi jî j' tirbê rabê
Ew nikarê me l' hev bînê

Divê tişta j' wan re bînim
Wa j' ser riya vegerînim
Divê razîm li ser piştê
Nikarim l' yekê myzînim
Ez berê xwe b' kê ve bikim
Divê serî l' xwe bişkînim

# Nêrgiz

Nêrgiza min tu şîn bû
Û te şax vedayî
Mi b' hêstirê çavê xwe
Dîlber tu av da yî
Hebû' l' hawîrdor
Gulê zer û sor
Tu bilnd firî û firî
Tu b' kelbeşê mayî
Nêrgiz nêrgiz nêrgiz
Nêrgizê ciwanê
Nêrgiz nêrgiz nêrgiz
Tu b' halê min nizanê
Nêrgiza min nêrgiza min

L' min dîçû xewa şeva
Dilê min mabû b' teve
Mi tu xwest û te neva
Ji bo çi te taba min
B' avê de berdayî
Hebû l' hawîr....

Gelek keç hebûn li vir
B' zanayî dilê min bir
Te xap da û mi kir nifir
Îdî l' xwe neyzeke bê
Ti di kê alayî
Hebû l' hawîr.....

D.M

# Nêrgiz

Te soz da min sed carî
L' ber xelkê vî bajarî
Ruhnî l' ber te bo tarî
Heyf û mixabin ku ti
Lê keça kurdayî
Hebû l' hawîr....

Sewdan te b' xwe winda kir
B' mir e b' xap û hîla kir
Û sêwîyê guhê gunda kir
Ta mirinê tu pêve
Mayî girêdayî
Hebû l' hawîr....

**Sirûd** **Yek bin Bi du qolî**

Keç: Yekbin bi hev re
Bidin soz û peyman
Bese bin destî
Ev qa sal û zeman

Kur: Bi xwendin û top
Tev de bikin xebat
Ji bo dengê we
Herê koma cîhan

Keç: Em keç di cengê de
Şer dikin wek mêran
Wek gura em dadin
Dij min dibe wêran
Mistek axa welat
Bihatire j' zêran

Kur: Kurd tevde bibin yek
Bi hev re bidin soz
Em li dijmin bikin
Tim dûman û bahoz
Azadîya welat
Bo me armanc û doz
Welat bi parêzin
L' dijmin bikin ferman

D.M.

# Yek bin

Keç:

Welatê meyî şêrîn
Çav li riya meye
Divê j' me birjî xwîn
B' min û te hewceye
Kurd hemî bibin yek
B' tenê besî meye
Û ala bilind bibê
Û herbijî kurdistan

Keç û kur:

Me d' vê sefirazî
Bese belengazî
L' we hewar û gazî
Tev bibin şorişvan

# Li vê qehrê

Hewar gelî bira hewar
L' vê qehra gu min îsal xwar
Yek bîst kufletê wî hene
Ji nêza dimrin reben e
Bi carekî w' nakî tu kar

Tim bihna xweş pê dakirî
Şûr simbêlê wî na birî
Her diçî û tê li sikakê
Ew karekî j' xwe re nakê
Jêre çiye fedî nakê
Bere kuflet tev bimirî

Bi topiska xwe d' weşîne
Kirasê jinê tev pîne
Kê dîtîye wek ve mêrî
Dernakevî b' şev newêrî
B' çavê mezin l' xwe dinêrî
Ha ev zend û bendê wî ne

Xelkê teva danîye qût
Ew mala wî maye zelût
Herkes bi kar pera tîne
Ew guretî besî wî ne
Zarok li mal tev birçîne
Tevde mane tazî û pê rut

D.M.

# Li vê qehrê

Wê bi mire herê tirbê
Go mala wî pîsî l' vir bê
Gelek merez xist vî zikî
Ev bajar tev pê hetikî
Ne d' lebitî ne kar dikî
Berdine wî wê çêtir bê

# Ka dilê min

Ka dilê min ti dil bîne
Kuro dila ne revîne
Te divê wer min bi xwaze
Te navê min ne xapîne

J' te hez dikim bi helalî
Te j' bîr nakim hezar salî
Min bi xwaze dil dinalî
Te soz daye bi cî bîne

Te dil bir û derman nakî
Kes bi vî halî te nakî
Te divê dilê xwe şakî
Ew adet l'cem me nîne

# Du stêr

Du stêr lhene li asmana
yek zînê ye û yek jî meme
Dido di rexwan de hene
Yek tiwî yek ez bi xwe me

Sipas ji bo vî xwedanî
Dilê me li hev rast anî
Ti b' xwe wek şitlek rîhanî
E' b' xwe jî ne kêmî te me

j' xortanî çûm pîratîyê
j' ber awirê te zerîyê
Ti b' xwe bû yî wek gemîyê
dilê m' bû ye behra xema

Berê dinya l' mi çawa bû
M' hij tekir mal l' mi xera bû
Lê paşî şensê min rabû
Giha me xifşa l'nav lema

Tu xwe li min paye neke
Ez çi bêjim tu deyneke
Destê min di baxla xwe ke
Bejin rîhana l, ber çeme

# Lê nazê

Lê nazê lêlê nazê
Can û celeng û delal
Kihêlê gerden gazê
Mi b' xwe re bike heval

Tu xwyayî rêwingî
kengî hatî vir kengî
E' b' xulama wî rengî
E'l' te d' gerim ev çend sal

Dilê minî wek kevir
Êş berda ye qîzê vir
Teva zora wî nebir
Ji xeynî te çav xezal

Şikir j' xwedê re tu hat
Ti wek rojê l' min hilat
Çavreşa awirşewat
L' bendî te bûm pîr û kal

Were cem min b' mêvanî
Bib' helala vî canî
Ez malxwê tu kebanî
Kerem bik de m' herin mal

D.M.

## Lê nazê

Çiqa b' gerîm li dinê
Kubarê şêrînkenê
Nabînim wek te jinê
Nazik b' şewq û şemal

# - Gula sipî -

Ez gulim gulim gula sipî me
Kurdim keça kurdekî gundî me
Nav û nîşanê min her xwyane
Herkes mi nas dikê bê ez kîme

Li min ferze her ew ceng û xebat
Herdem şiyarim va roja min hat
Rihê xwe dikim bi gorî welat
Di meydanê de e b' sed mêrîme

Kurd im û merd im herkes dizanê
Keça kurd bi deng e li cîhanê
Welat bivê şêr im li meydanê
Rojên cengê pir dijmin ez dîme

Rojên cengê l, kurdistana rengîn
Da dim dijmin wek şêrê dev bi xwîn
Ne kêmî mêr im bi kuştin û jîn
şorişgêrê kurd el pişta wî me

**Beste**

# Ey newroz

Ey newroz ey newroz
Tiwî cejna azadî
Bi xêr bê û gelek pîroz
Kurd te b' rihê xwe nadî
Te pir serê me hilda
Me bindestî nema dî

Kawa yek bû ji kurda
Wî derba mezin danî
Şikand serê ne merda
Xwe j' bin destan deranî
Kurd na mînê kêmketî
Cîhan tevde b' me zanî

Neyroz tu bûka salê
Cejna kurd û kurdistan
Bere dijmin binalê
Tev rabin bikin dîlan
Û ala ringî hildin jor
Bi gorî wê rih û can

# Meş ordek

Meş ordek meşordek
Karxezala çav belek
Were li min bi pirse
Te derdê min kir gelek

Te dil hişte birîndar
Bi awrê xwy dijawar
Te soz da min hezar car
Kanî ew soz û emek

Nikarim j' te bibim dûr
Û miryê te me gulîhûr
Dilê m' bûye behra kûr
Ti b' xwe l' ser bûyî kelek

J' kerba te dikim nalîn
Û kezba min bûye xwîn
Were cem min nazelîn
De m' bikin kêf û henek

# Wa delalo

Wa delalo ez helîyam
Îro sê ro ti ne l' malî
Wa delal j' kerba mirim
Kolan mane xir û xalî
Wa delal rih l' mi neme
Sebra m' ti car bê te nayê
Wa delal min ji bîr neke
Tu pir li cem min delalî

Ger tu evîndarê minî
Ber soza te b' serê xwe bê
Neçe j' ber çavê mi j' binî
Go dilê te l' ser min hebê
Û heger tu bi min di kenê
Xweda li ser bextê te bê
Te soz da min bi cî bîne
Bes bihêle dil binalî

Pir ji te hesdikim delal
Go ti bi rastî bi meşê
Zenda j' te re bikim balgî
Şa bibe bi min keleşê
Lê ne bêje bi te kenîm
Êdî tu min dikî reşê
Xortê kurda nadin xapa
Go bimînin hezar salî

# Gulbehar

Lê gulê gulbeharê
Tu beharî tu beharî
Xifşê xezal û karê
Te z'kirme parçe û parî

Behara dilê minî
Gulê Gulê Gulbehar
Heywax wextê ti d'kenî
Mi d'kî ava germ û sar
Horîyî tu ne jinî
Maşalla hazar carî

Ti b' xwe nayê wesfedan
Ziman bo wê lal dibê
Şewqa te avêt asman
Bihtir ji stêra sibê
B'hisna xwe da min derman
Ez kirme tirba tarî

J' binî nikarim rabim
Tev ji kul û ji kerba
Divê li xwe miqate bim
Te ez kuştim bi derba
Lê ku te j'xwere nebim
Kes b'derdê min nikarî

# Xwezka

Xwezka bûba me nehtor
Lê tu jî bûba ne rez
Xwezka bûba me şivan
Lê ti jî bûba ne pez
E' l' kû bame tu l' cem mi ba
Û kilê çava bu bane ez

Dê were cem min keçikê
Rûne l' alîkî l' qurçikê
Devê min têxe qirikê
Bi nazikî l' min bik lez

Xwezî ti bûba gulek sor
Ez strî bane l' hawîrdor
Te sing vekirba û çira kor
Û ez bihate bi maç û gez

Wa xwedêyo malî ava
Te da m' keçek noqzirav e
Kengî m' bibin bûk û zava
Bi mînin bê kul û merez

# Naverok


| | |
|---|---|
| Pêşgotin | 1 |
| Eman cîhan | 2 |
| Eyhanê | 3 |
| Bê sozê | 4 |
| Rewşenê | 5 |
| Çavreş | 6 |
| Gulperî | 7 |
| Meşî û meşî | 9 |
| Hemberî min | 10 |
| Narincîyê | 11 |
| Nexwyane | 12 |
| Gulê du gul | 13 |
| Zînê | 15 |
| Lê narînê | 16 |
| Ax ji kerbê | 17 |
| Bêje eman | 18 |
| keça kurd | 19 |
| Canê | 21 |
| Nazik e | 22 |
| Gundîno hewar | 23 |
| Serî deyne | 24 |
| Pir şêrîn e | 25 |
| Ez kurd im | 26 |
| Hiyamê | 28 |
| ji serê xanî | 29 |
| Ez nikarim | 30 |
| Ev dilê min | 31 |
| Li nav bexçe | 32 |

Kî Karê 33
Ka destê xwe 34
Xwe ne veşêr 35
Xemê 36
Mal di gund de 37
Şukrayê 38
Kezîdirêj 39
Dil birişt 40
Îro dîlan e 41
Çavkevan 42
Kinê 43
Ev hef sal 44
Qudret û qublet 45
Ew jî jin e 46
Navê tey şêrîn 47
Welatê comerdan 48
Ez xort im 49
Ez te nadim 50
Ez ne har im 52
Dîlber hat 53
Nemîne raketî 54
Heyatê 55
Derkeve der 56
Dîna welat 57
Hey wax 59
Ez Bilbil im 60
Ez pir delal im 61
Işq û evîn 62
Dil kanî ye 63
Wa Mencê 64
Xortên serbaz 65
Nemîne razayî 66

| | |
|---|---|
| Gerdengaz | 68 |
| Ez sûnd dixum | 69 |
| Çava kilke | 70 |
| Tu sebebî | 72 |
| Xewna min | 73 |
| Porsor | 77 |
| Ey newroz-sirûd | 78 |
| Sînem | 80 |
| Ev sed car | 81 |
| Kurdistan ya neman | 82 |
| Hêstirê min | 83 |
| Kî heye | 84 |
| Tu newe | 86 |
| Yar yar | 87 |
| Xatûn | 88 |
| Kubar can | 89 |
| Mala we | 90 |
| Bikin gewrê | 91 |
| Destê canê | 92 |
| Nede xapan | 93 |
| Ez poşman im | 94 |
| Çavê xezalê | 95 |
| Dengek xweş tê | 96 |
| Gelek dêşim | 98 |
| Ew mi d' kujî | 101 |
| Tu minetan | 104 |
| Li nav Gula | 106 |
| Bi şûnika | 108 |
| Nêrgiz | 109 |
| Yekbin | 111 |
| Li vê qehrê | 113 |
| Ka dilê min | 115 |

| | |
|---|---|
| Du stêr | 116 |
| Lê nazê | 117 |
| Gula sipî | 119 |
| Ey newroz- Beste | 120 |
| Meşorder | 121 |
| Wa delal | 122 |
| Gulbehar | 123 |
| Xwezka | 124 |



**Hunermend: se'îd Yûsif**